Rapora YASA ya mehane
Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

Avrêl 2010

YA§A e.V.

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

YASA e.V.
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org

Enwer Deqori

Naverok:

Welatiyê Kurd Reşo Ebas Ibrahîm hate girtin
Desthilatdariya Elmanya penaberekî Kurd binçav dike û dê wî vegerîne Sûriyê
Navên hinek cotkar ji doseyên meşqên wek hev û peymanên kirê hatin rakirin
Li Reqayê girtina Kurdan piştî bûyerên Newrozê jî berdewam kirin
Ji bo girtiyên Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê sezaya zinadanê hate birîn

Welatiyê Kurd Reşo Ebas Ibrahîm hate girtin

Di roja 28.03.2010an de vedorgerînek girêdayî Ewlekariya Komarê li Qamişlo welatiyê Kurd Reşo Ebas Ibrahîm (Jidayikbûn: 1990 Qamişlo), binçav kir. Hate ragihandin, ku vedorgerînê êrîşî firoşgeha wî ya bêrîkfonan kiri bû û Computerê wî yê taybet jê standi bû. Welatiyê Kurd Reşo Ebas bi tena xwe malbata xwe xwedî dike, nexasim piştî ku bavê wî, yê ku çalakvanekî siyasî bû, di 02.11.2007an de hate binçavkirin û ji kar hate avêtin.

Desthilatdariya Elmanya penaberekî Kurd binçav dike û dê wî vegerîne Sûriyê

Rêxistina Mafên Mirov li Sûriyê-MAF ragihand , ku endamê wê, Enwer Deqorî, di roja Şemiyê 03.04.2010an de li bajarê Halle-Saale li Elmanya hate binçavkirin. Rêxistina MAF dibêje, ku ew ji ber rûniştina ne rewa li Elmanya ji hêla asayîşan ve hatiye girtin, û ew dê ji aniha û heya sê mehên din ji bo Sûriyê bête vegerandin.

Tê zanîn, ku Enwer Deqorî beriya vê carê di 20.10.2009an de, bi behaneya, ku ewî xwe wek penaber li Ferensayê da bû, hati bû girtin û bo Ferensayê hati bû vegerandin. Ferensa wî çaxî bi

mercê derketina Enwer ji xaka xwe ew serbest berda bû

Navên hinek cotkar ji doseyên meşqên wek hev û peymanên kirê hatin rakirin
Di 17.03.2010an de Wezareta Çandiniyê û Reforma Çandinî li Sûriyê biryara jimar 2707/S bo hemû Kargêriyên Çandiniyê li parêzgeha Hesiçayê belav kir. Biryar derfetê dide, ku navên hinek cotkar ji doseyên meşqên wek hev û peymanên kirê bêne rakirin. Hemû cotkar, ên ku navên wan hatine rakirin, Kurd in.

Di biryarê de hatiye nivîsandin, ku divê navên van cotkaran ji doseyên meşqên wek hev û peymanên kirê, yên girêdayî navçeyên Kargêriyên Çanidiyê, bêne rakirin, ji ber ku ewan erêkirinên yasayî li gorî yasaya jimar 41, ya sala 2004an û guhertinên wê, yên li gorî biryarên wezarî, bi dest ne xistin. Rêxistinên Mafên Mirov li Sûriyê (MAF û DAD) ragihandin, ku dora 300 daxwazên erêkirinê hene, ku ne hatine pejirandin. Ew jî dora 35000 Donim ji zeviyên parêzgeha Hesiçayê dikin. Yanî bi vê biryara han dê zeviyên 300 cotkarên Kurd bi zorê ji wan bên standin.

Li Reqayê girtina Kurdan piştî bûyerên Newrozê jî berdewam kirin
Di Avrêla 2010an de hêzên ewlekariyê li bajarê Reqayê gelek welatiyên Kurd binçav kir. Girtina Kurdan piştî bûyerên Newroza 2010an li Reqayê, ku hêzên ewlekariyê gule li welatiyên Kurd barand , hinek hatin birîndarkirin û du welatî jî jiyana xwe ji dest dan, bêtir bû. Ji kesên, ku hatine binçavkirin: Sebrî Nebî, Nezmî Nebî, Reşad Mihemed, Idrîs Mihemed, Salih Mihemed, Mehmûd Heyder, Ibrahîm Farûq Ibrahîm, Egîd Mihemed Boşan û Arif Mihemd Elî.Herwiha hinek agahî hene, ku hinek birîndarên Newroz ji Reqayê bo Şamê hatine guhastin.

Ewên ku hatine guhastin ev in: Mihemed Xelîl, Elî Mihemed Îsa, Kanîwar Sebrî Nebî, Mihemed Mislim Mûsa, Xelîl Mehmûd Refo, Mihemed Elî Goreş, Yasir Mûsa û Ebdil Qadir Elî Seîd.Herwiha hate ragihandin, ku çarenivîsa Şivan Felemez Ferho, ku ji Qamişlo ye û hîna pola 12an ji dibistanê dixwîne, ne diyar e. Ew jî ji ber bûyerên Newroza Reqayê hati bû girtin. Herwiha hinek welatiyên din hene, ku heya aniha malbatên wan cihên girtina wan nas nakin û herwiha çarenivîsên wan ne diyar in. Ew jî ev in: Mihemed Elî Mihê (Jidayikbûn: 1963 Kobanî) û Şekir Mihemed Derdane.Li hemberî van girtinan çar gêncên Kurd serbest hatin berdan. Ew jî ev in: Masûm Mihemd Os Dîk, Kawa Osman Ebdela û herdû welatiyên, ku bi geleyan birîndar bû bûn: Xelîl Mehmûd Xelîl û Elî Mihemed Îsa.

Ji bo girtiyên Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê sezaya zinadanê hate birîn
Di 18.04.2010an Dadgeha Ewlekariya Komarê li Şamê pênc sal zindan li girtiyên Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê birîn. Nezmî Ebdil Henan, Yaşa Xalid Qadir, Dilgeş Şemo Memo û Ehmed Xelîl Derwîş, ku endamên Yekîtî ne, bi parçekirina beşekî ji xaka Sûriyê û gihandina wî parçeyî bi welatekî biyanî ve, li gorî bûjena 267an ji yasaya sezayên Sûriyê, hatin tewanbarkirin û sezakirin.Ji aliyekî din ve Partiya Yekîtî ragihand, ku endamê wê, yê girtî, Tehsîn Xeyrî Memo bi van her çar hevalên xwe re hati bû binçavkirin û ji beriya salekê ve ji zindana Seydnaya wendayî ye. Hevalên wî dibêjin, ku Asayîşên Leşkerî yên zindana Seydnaya ew ji bo şaxê vepirsînê yê Ewlekariya Leşkerî li Şamê guhast. Tê zanîn, ku ev her çar kes di gel Tehsîn Memo di 31.01.2007an de bi êrîşa vedorgerîneke Ewlekariya Leşkerî li ser mala Yaşa Qadir bi hev re hatin biçavkirin.